Derçûn ji desthelata manayê

Gomana şiîrî û gomana rexneyî

Hoşeng Şêx Mihemed

Renge di vê derê de pêdivî be dû gomanan jêk cuda bike,
Gomana şiîrî:
Gomaneke di nav fentaziya û zimanek hestiyariy deng bûye, endêşe û ziman tê de digehine pileyên bilind. Estatîka balê xwe dikêşe ser layenên din yên têkstî,
Eve ji layekî, ji layekî din ve gomana şiîrî bo hindê nahê da heqîqetekî bo me aşkira bike. Belkî pitir bo hindêye destê me bigire da li heqîqetê bigeryên. Ew heqîqetên ku em neşiyên bi hizirkirinê berhem bihînîn, anku gomana şiîrî heqîqetan pawan nake û xwedan çi heqîqet jî nîne, bi ankûyeka dî gomana şiîrî wateyan nade me, belkî pitir girtina gavên geşên zimanî û amajeyên estatîkî û hêmên çêjbexş û nigokirina wane di nav tariyatiya ciwanyê de.
Anku heqîqet di şiîrê de. Tarî ye, tu neşêy bigirî û dest lê bide, belkî bi tinê lê digerêy, bi vî anku şiîr geriyane di tariyatyê de û heqîqet jî..
Heqîqeta çemk û têgehiştinên dinya, jiyanê, mirovî û ne diyarin. Şiîr sefere ber bi gomankirinê û pirsiyarkirinê ji tariyatiyê.
Di gomana şiîrî de ziman hemû tiştan dorpêç dike û nezanînê dike

ber têkistî, anku estatîkê dide me,
Stiratîjiya gomana şiîrî çêkirina ciwankarî û bilindkirina zimaniye ta bibe xwedan pitirîn amaje û nihênî û girîmane, bilindkirina zimaniye ta wî astî ku ziman wek pît, peyv û destewaje di nav medlulatên hemecur, her dalek bibe remz bo medlulatên bê dûmahî.
Anku pêkoleke da şiîr jî bigehite pila muzîkê dastê pirsiyar kirin û bexşîna manayek bixwe ve, her wesa bigehite pila temasgirtinê li gel siruştî û amajên tijî mana û bê mebestên kiryarên sirûştî.
Bo nimûne.. Birêveçûna ba î, sema belgan, dengê teyir û tewala, têkelbûna rengan, rojavabûn, rojhelatin û gelek diyardeyên din yên estatîkî, lê hişyar jî bin weha tênegehin ku mebesta min bi vê çendê rêbaza romantîkî ye, ne.. Behsa me ji vê çendê dûr e û ew babetek dine û diçe dixana polînkirina rêbazên edebî de û peywendî bi suhbeta me li vê derê nîne, ew arîşeka din ya edebê kurdî ye bi giştî û di vê derê de neşiyên basî wî babetî bikin.
Anku gomana şiîrî girtin û komkirin û xirvekirina tîrojkên zimaniye, di nav ruha têkstê de, anku gomana şiîrî ew gomane ewa di ruha têkstê de bilindtirîn û geştirîn û pirehendtirîn û fireamajetirîn reng û deng û tîrojkên zimanî vedişêre.
Gomana rexneyî
Ew gomane ewa bi berûvajî stiratîja gomana şiîrî kar dike, anku bi arasteka hevdij li gel zimanê şiîrî kar dike.
Gomana rexneyî pêkol dike ruha têkstî hilweşîne û amaje û hêm û nihênî û pirsiyarên têkstî berelake û bersivan nîşan bide û tîrojkên zimanî berde.
Zimanê rexney pitir bo hindê dihê da zimanek hizrî û eqlanî berhev bike û hindek bersivan bide xwandevanî, remz û hêm û dêmên nepenî rave dike û hewil dide heqîqetan bide xwandevanan.
Li ser hilweşandina goman û nihênî û pirsiyarên têkstî kar dike da bibe xwedan heqîqet û raman.
Anku gomana rexneyî bo berhemhînana manayan kar dike, stiratîja wê berhemhînana mebest û ankuyane, hemû têkstan dibe ber dergehê manayekê yan wîstgeheka wateyan, desthelata goman, pirsiyar û nihêniyan nahêle û desthelatekê bo bersiv û manayan çêdike, azadiyê bo zimanî nahêle ku amajeyên cuda û rengên cuda di têkstî de bixulqîne, berûvajî têkstê dike erdek tijî mana û mebest, têkst dibe çalakiyek hizrî ne wekî ruhî, têkst dibe karek ebstimî, ne wek ciwankarî, têkst renge bibe felsefe, yan siyaset, yan dîn, yan zanist, yan fêrikirin, yan her babetek dî û kayeyek dî. Di wê gavê de têkst namîne şiîrek estatîkî û xewnek berdewam, neçar têkst li ber

derazînka mêjûyekê, yan bersiveka yeqînî yan merîfekî taybet biraweste û wek çalakiyek ruhî bi dûmahî dihê.
Bidûmahî dihê û dibe mana, bersiv û renge bimire...!
Gomana rexneyî gomanek kujeke, xwedan stratîjiyeteke ku berdewam pêkol dike zimanî bigire û nehêle bilind bifire û ji desthelata manayan derbaz bibe, têkstên şiîrî jî bibin têkstek li derveyî desthelata manayên cûrawcûr, şaîrî bifirin û bo xwe asmanek taybet çêbikin û amajeyên taybet berhem bihînin bêyî ku rexne delîvê bide ziman bo mawekî ji mebestgerayê dûr bikeve û em berhemek nû bibînîn.
Sîstemê gomana rexneyî her dem gomanek rehendkuj û berhemhînana bersivane li ser pirsiyarên têkstan.
Sîstema karkirina gomana rexneyî jî li ser reşkirin û vemirandina rengên têkstî dihê û reng û mebestên xwe didane ser têkstê, anku pêkolek aşkiraye ji bo têkstê bike di bin deshelata xwe de û têkst bêyî wî nejî û henasa nehilkêşe, da ku ew bersiv û zîrekiya xwe bi ser nepeniyên têkstê bixe.
Di vê derê de eqliyeta şiîrî û eqliyeta rexneyî jêk cuda dibin.
Eqliyeta şiîrî pêkole bo arastekirina mirovî ber bi estatîka û ciwankariyê lê eqliyeta rexneyî arastekirina miroviye ber bi mana û raveyan. Anku dû dunyayên cuda û renge hevdijî bin.
Di vê derê de pirs ew e têkst bi xwe wê delîvê bide rexnê, da rexne çi manayek bivê lê bar bike..? Yan rexne, bi xwe xwedan ew desthelate, da bişê beramberî her têkstekê xwe nimayiş bike û mumaresa stratîjiyeta xwe bike li ser her têkstekê şiîrî hebe..?
Yan her di binekok de ji ber ku desthelata têkstê bes çêkirina pirsiyar, goman û nihêniyane.. Û desthelata rexney keşifa wan nihênî, bersivane û berhemhînana manayane bo wî êkê desthelata rexney pitir bişê xwe biselmîne û bi ser têkstê de zal bibe?
Lê aya mebest çî ye.. Aya pêdivî ye şiîr bê mana be..?!

Desthelata manay

Ez nabêjim şiîr bê mana be, lê pêdiviye şiîr ew mana be ewa ji encamê peywendiya min wek xwandevan û têkstê de çêdibe, anku ew pirsiyar, nihênî û gomanên ku encama kûrbûna min di deqî de çêdibin, anku ew peywendiya di navbera min û têkstê de çêdibe, pêdiviye xweser di navbera me de çêbibe, ne wek bi rêka nivîserî, anku her deqek afirander.. Pêdiviye bişê gomanên xwe yên şiîrî bigehîne xwandevanî bêyî ku gomana rexneyiya şaîrî li ser be,

Pêdiviye têkst ji derveyî şarî bijî û çi peywendî bi şarî û desthelata û ya rexneyî nemabe, anku em di vê derê de dişêyin basê şiîrên azad û ne azad bikin.. Şiîrên nemir û mirar.
Lê aya mesele peywendî bi çi ve heye bi şiîrê bi xwe ku terzek edebî û hunerî û ruhiye, yan peywendî bi rexne, rave û xwandinê heye ku ew jî terzek edebî, hunerî û hizrî ye.
Aya desthelata şiîrî û şaîrî çewan destnîşan dikin û jêk cuda dikin? Û desthelata xwandin û rexnegirî bi çi polîn dikin û çewan dê li gel azadiya şiîrê û şaîran têkel dibin û çewan jî kiryara xwandin û ravekirinê çêdibe..?
Têkelbûna her du dunyayên ruhiya şiîrê û hiziriya xwandinê, çend desthelatekê bide ji wan berhem dihîne ku ew jî desthelata ruhî û hiziriye pêk ve û renge ez bêjimê desthelata edebî, yan desthelata xwandina şiîrê, yan desthelata ravekirinê, yan desthelata manay.
Ewa di vê vekolînê de.. Piştî vê pêşekê min divê li ser birawestim, desthelate. Ewa şaîr bi ser deqên xwe yên şiîrî de ferz dike, anku desthelata şiîrî, ta nizimtirîn ast dihê beramber desthelata manayan ku di deqî de delîve nabe em goman û pirsiyaran bikin, yan heger bikin jî gelek zû yan êkser em bigehîne bersivên yeqînî û delîve nemînin ku em dirêjiyê bidine xwandina xwe.
Anku di vê derê de deqên şiîrî ku bi dîtina me pêdiviye xwedan gomanên şiîrî bin, di gomanên rexneyî de nigu dibin, şar ji bilî ku deqekê afirandî şiîrî bixulqîne, deqekê rexneyî berhem dihîne, anku ew deq ji bilî ku şiîr bin, dibine deqên rexneyî, çunke deq.. Ber bi vebûn û valakirina xwe ji pirsiyar û gomanan diçe û ziman tê de dihilweşe û ji bilî bibe saxtmanek pite û bo komkirin, hewandina pirsiyar û gomanên bê dûmahî.. Dibe bingehek bo mana, rave, hizirên rohn û aşkera.
Şaîr jî di nav wî saxtmanî de dibe rexnegirek zîrek û rehendên rexneyî bi ser têkistên xwe de belav dike û tu her pirsiyarekî jê bikî yekser bi felsefe, yan hizir, yan her babetek dî bersiveka yeqînî dike di destê te de.
Anku dunya şaîrî ku em dibînîn pêdiviye pitir ruhî be, nehizirî, şiîr jî pitir estatîka be, ne.. Mana, di vê derê de berûvajî dibe, dunya şairî dibe dunya hizirî û şiîr jî dibe gorepana manayan, ziman dibe kerestek û amîrek bi tinê bo veguhastina wan manayan ji şarî bo xwandevanan, xwandevan jî dibe wergirek nîgetîv bêyî ku pişikdariyê di avakirina şiîrî de bike û dalên zimanî bike asoyek bo medlulatên cûrawcûr.
Di vê derê de desthelata manay.. Dibe desthelata hizriya şaîrî, têkst jî

dibe deqê şarî û ziman jî dibe zimanê şarî, anku şar desthelatek rehaye li ser hizir, estatîka û zimanî, di vê derê de şar dibe xwedavend û têkst jî berhemê wî xweday.
Milmilana min wek xwandevan li vê derê li gel wan xwedavendan dest pê dike, di vê vekolînê de min divê li ser hindek têkst û dengan birawestim, ewên şarên xwedavend berhemhînayne û renge jî gelek ji wan têkst û dengan wek nûxwaz û remzên şiîrî li deverê bihên temaşakirin û hijmartin, min divê di vê derê de pêkolekê bikim nêzîk bibim ku li heqîqeta şiîriyet û şairiya wan bigeryêm, ta radekî bizanim desthelata wan şaran li ser ziman û nivîsînê çend e û deqên wan jî çend azad û xwedan rehendên estatîkî û ciwaniyêne.
Min divê her çi nebe pêşberiyekê bikim ka dunya wan şaran çend ruhiye û çend hizirî? Çend şariyane û çend rexnegirane û çend felsefiyane û çend dînyane û çend siyasiyane ye, bi şiîrên xwe berê xwe dide mirov û peywendiyên xwe.
Û heger bişêm bizanim ka ew nivîser şarin, yan feylesof, yan siyasî, yan dîndar, yan her nasnamek ku şiîrên wan nîşanî me didin.
Di vê vekolînî de, dê hewl bidim qesên min verêjên wan têkstan bin, ewên ez dixwînim û dê hewl bidim bişêm ziyatirîn hijmarên nivîseran bixwînim, bi taybetî ewên li pey xwandin û nasnamên edebiya evro bûyine şar û wek hozanvan, yan çamebêj hatîne niyasîn.
Min divê ezmûna wan yê şiîrî, pêk ve û bi cuda jî hindî şiyan hebin wergirim û bizanim ka her yek ji wan şaran bi çi cûr û çend desthelatên xwe û manayên xwe li ser têkstê sepandîne, çend jî nesepandine, bo vê çendê jî ez dê hewl bidim li ser berhemên wan nivîseran rawestim û hewl bidim têgehiştinek giştî û taybetî berhem bihînim.
Bi pêdivî jî dibînim li vê derê bibêjim merema min nîne di vê vekolînî de bibêjim ev şiîre xirabe û ya din başe, yan filane kes şare û fîlan jî ne şare, min divê sîstemê nivîsînê li nik wan dengan şirove bikim û ta radekî têbigehim ka desthelata şiîrî, şarî, mana, hizir, ruh û estatîka di têkstên wan de çewan berhem hatîne û ew têkst çend azadin û çend jî desteser, çend dişên xwedan fireamaje û mana bin.. Çend jî tepeser û takerehend. Çend goman û xwandineka kesokiye û xwedan çi heqîqetên reha jî nîne, bi tinê gomanek şiîrî di destê min de ku ez vê sefer û lêgeriyanê dest pê bikim.